## Serkomarê rêjîmê, lat lûtan ji bo qedandina serhildana Jînayê bi kar tîne!

»»» R:7



## Kurd û xebat binbir nabe

»»» R:3

*Bidestveanîna mafên neteŵî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siyasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (454) 24-09-2023 Buha (1000) Tûmen*

## Şerefkendî- Rêberek neteweparêz û berdewamkerê rêya Qasimlo

»»» R:4

## Asoyên Serhildana Siwêdê

»»» R:8

# Mistefa Hicrî: Parastina netewî û tekoşîna girseyî li Kurdistanê dibistanek e ji bo hemû kesên ku çavê wan li guherunkariyan e

**Deqa peyama Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê:**

Hevnîştimaniyên hêja!

Kurdistaniyên xweragir!

Di demekê de em li salvegera şehîdkirina Jînayê nêzîk dibin, ku berxwedana xelkê Kurdistanê, netewên bindest û azadîxwazên Îranî li hember dagîrkeriya Komara Îslamî gihîştiye lûtkeya xwe. Ev berxwedane di du qonaxan de tê dabeşkirin, qonaxa berî tevgera Jînayê û ya piştî vê tevgerê.

Em niha di rewşekê de ne ku tevgereke berfirehtir derketiye holê ku berê xwe di şiklê çend tevgerên cuda de nîşan dida. Her çend pêlên xwenîşandanan di van salên dawî de bingehên desthilatdariyê hejandibûn, lê bi destpêkirina tevgera Jînayê ku di bin dirûşma “Jin, Jiyan, Azadî” de derketibû holê, civakên li nav Îranê ketine qonaxekê ku nîşana serhildanek giştî li dijî navenda desthilatê bû. Tevger ek ku nirx û buhayên wê ji Kurdistanê ve serî hilda û tevahiya şeqamên Îranê li xwe girt; Tevgereke ku di demeke kurt de karî peyam û wateyên xwe ji Kurdistan û Îranê ve bo asta cîhanê vebiguhezîne.

Ji rehenda Kurdistaniya wê ve, tevgera Jînayê pişta xwe bi tevgerekê re girêdaye ku wateya wê ji jin, jiyan û azadiyê ve tê. Pêşîneya van wateyane ji tevgera rizgarîxwaziya Kurdistanê ve çavkanî girtiye ku bi dehan sal in ji bo wekhevî, jiyana dûr ji bindestiyê, azadiya mirovî û nasnameya neteweyî berdewam e, tevgerek ku îşare ye bo vejîn û pitir geşkirina hesta netewî.

Kurd li Rojhilatê Kurdistanê piştî çend dehikan karî hin ji nirxên xwe li derveyî sînorên Îranê jî bixe rojevê. Bi radeyekê ku Kurdistan kir şêwazek ji berevanî û serhildanê da ku wateya kurdistanbûnê û nirxên wê yên nîştimanî û mirovî rohntir bike. Berevaniya netewî û xebata girseyî li Kurdistanê, bûye dibistanek ji bo hemû kesên ku çavê wan li guherinkariyê ye. Dagîrker û destûpêwendiyên wê hewl didin ku me weke civak tine bikin û bikin tak. Lê di vê yek salê de civaka Kurdistanê carek din ew îradeye nîşan da û îspat kir ku ji bo komek armancên mirovî û netewî têkoşînê dike û hêz û wizeya xwe ya şoreşgerî zindî dike.

Girîngiya vê xebata girseyî ya li Kurdistanê di wê yekê de ye ku îradeya giştî ya civakê xurtir kir û wizeya rawestiyayî ya Rojhilatê ber bi armanceke nîştimanî ve bir. Heman mijar ku tirsa hertimî ya rejîma Komara Îslamî jê hebû. Her di vî warî de pêşengbûn û pêgeha Kurdistanê di hevkêşeyên siyasî de ji bo hemû aliyekê rohn bû. Bi curekê ku xwenîşanderan û xelkê serhildêr ên navçeyên din ên Îranê, gelek bi rindî wateya hevgirtin û yekrêziyê fam kirin û hawar dikirin: “Tehran dibe Kurdistan, Îran dibe gulistan”.

Tevgera Jînayê ji aliyê nirx û dirûşman ve, tevgera herî pêşketî ye û di warê erdnîgariya serhildanan de jî tevgera herî berfireh e ku di dîroka Komara Îslamî de hate ezmûnkirin. Ev tevgere tenê pêçandina desthilata navendî nîne, belkî armancên mezintir heye, ev jî avakirina jiyaneke serdemiyane ye û daxwaza serwerî, wekhevî, kiramet, mafê takekesî û netewî bo hemû pêkhateyan bi bê cudahîdanîn dike. Di vî warî de armanca demdirêj a vê tevgerê pêçandina pêwendiyên dagîrkarî û hevkêşeya bindestî-serdestî li Îranê ye.

Aliyeke din a şoreşa Jînayê ku ji Kurdistanê ve serî hilda, tekeziya Kurdistaniyan bû li ser redkirina tevahiyetxwazî û dûrketin ji armancên tevgerê, îcar di her şêwe û formekê de be. Heman mijar ku ji destpêka şoreşa gelên Îranê ve, Kudistaniyan li ser wê tekezî kirin û amade nebûn ji bo berjewendiyên teng û demkurt, tevahiyetxwaziya ayetulahan qebûl bikin. Di heyama vê salê de jî yên ku bi qahîmî û xortî di meydanê de li dijî tevahiyetxwaziyê mabin, gelên bindest bûn. Ev tê wê wateyê ku siyaset li Kurdistanê tenê li ser bingeha desthilatdariyê nîne, belkî siyaset tiştek nîne bilî bexşîn, parastin û bihêzkirina kirameta



»»» Dom R:2

»»» Doma R:1

mirovan. Ew kirameta di dawiyê de bibe kevirê xîma hêz û desthilateke niştimanî. Aliyeke din a tevgera Jînayê, pirsa jinê bû. Jinên Kurdistanî yên ku di bin tepeseriya berfireh a dewletî, civakî û siyasî de ne, li dijî her cure newekhevî, tevahiyexwazî û navendgerayî sekînandin û xwe nîşan dan. Ev beşa girîng a civakê, hevdem zexta dîrokî ya li ser jinê hedef girt, di tevgera Jînayê de jî nîşan da ku serdema newekhevî û çewandina regezî, siyasî û netewî derbas bûye û êdî ti sîstem û îdeolojiyeke tevahiyetxwazî nikare desthilata tevaw bi dest ve bigire.

**Çend axavtinek jî digel hevnîştimaniyên azadîxwaz ên Îranî**

Xelkê azadîxwaz ên Îranê! Tevgera rizgarîxwaziya Kurdistanê li ser daxwaz û prensîbên xwe yên netewî û siyasî rijd e û ji xebat û nîşandan xwe di pêxema wan de sist nabe. Bingeha bîrkirina me jiyana bihevrebûna aştiyane û arizûmendane ye. Peyama me zelal e, em ti cure serberedayî û înkarekê qebûl nekin. Îran ji bo me kurdan û netewên din ên bindest nebûye naverokeke bêalî, belkî bo me erdnîgariyeke dagîrkerî û bê mafî bûye.

Em bi bîra xwe tînin ku li herêmeke netewî wek Kurdistanê zilm û zordarî berfirehtir bûye û bi wê astê jî berevanî û xebata wê jî gurtir bûye. Lewama tenê di rewşeke azad û rizgar de em amade ne ku bi şêweyê arizûmendane paşerojeke hevpar û xwestî ava bikin.

Yek ji nirxên şoreşa Jînanê azadî ye. Azadiyek ku kirameta mirovî û mafên hemûyan bi awayekî wekhevî nas dike û diparêze. Lewma tişta ku vê şoreşê daye me, nirxek mezin e ku dikare bingeha wekhevî, hevsengî û serweriya hevpar a di navbera gelan de misoger bike. Em li ser wê yekê rijd in ku serwerî û desthilatdariya yekalî ji holê rabe. Hêla me ya sor, çareserkirina pirsgirêka netewî û nasnameyî ye û em vê yekê tekane çareseriya demokratîk dibînin.

Aliyê din ê behsê ezmûnek e û me di vê salê de bihevrebûn û bihevrenebûn hebû. Destpêkê nirxên bilind ên tevgera Jînayê em bi hev re girêdan. Wê demê çavê Îraniyan li ser Kurdistanê bû û çavê Kurdistanê jî li herêmên dinê bû. Di van rojên ku berjiwendiyên giştî baskên xwe bi ser hemû derbasbûyiya sêhrayî û olî de kişabû, eniyeke berxwedanê hatibû avakirin, lê piştre ji rê derket. Cihê xwe ye ku em ji wan rojan ezmûnan werbigirin. Tişta ku dikare me di yek eniyê de bike yek, xeyala duh û tevahiyetxwaziya îro nîne, belkî vegerîn e ji bo nirxên bilind ên tevgera Jînayê.

**Xelkê Azadîxwaz ên Îranê;**

Rejîma siyasî li Îranê di bombestê de ye. Ger mirov li warên aborî, siyasî, çandî, civakî, jîngehparêzî û ewlehiya mirovî binêre, her rojek Komara Îslamî zêdetir li ser desthilatê bûbe; Krîz û metirsî zêde bûne. Li vir erkek exlaqî ye ku seh bi berpirsiyaretiyê bê kirin. Lewama ji ber vê hindê baştir e em bîr ji vê yekê bikin ku gelo bi berdewamiya vê rejîma ku li ser bingeha hizra faşîstî, xwînrijandin, tundûtîjî, cudahî û hwd hatiye avakirin, em dikarin dilê xwe bi jiyanek serdemiyane xweş bikin?

Peyama tevgera Jînayê rohn e. Têkoşîna me li ser pênasekirina maf, cih û pêgeha netewan û li ser vêdebirina pêkhateyên zordarî û bêmafiyê ye. Eva jî di demekê de bi dest ve tê ku meydan û eniya têkoşîna hevpar a hemû gelan û azadîxwazên Îranê bê xurtkirin. Ceribandina wehma derbasbûyî ku tenê ji bo berjewendîyên yekalî û taybet hatibû darêtin, dûrketin e ji armanca rastîn a tevgerê. Niha em hemû li ber ceribandineke dîrokî ne. Belavbûn, bêdengî û bêalîbûn xisaran zêde dike. Lê ya ku di dawiyê de dengê diyarker e, eniya şeqaman û hêza şikestnexwarî ya cemawer e ku erkê dawîanîn bi tevahiyetxwaziyê li stu ye.

Eva ku ez wek Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê dikarim bêjim ev e ku, tevgera rizgarîxwaziya Kurdistanê kevtiye nav qonaxeke nû. Serdem ku tê de xebatkarên bajar selmaniyane ku çepereke rastî ye li hember dagîrker. Xebat û parastina rewa bi mafên rewa ve girêdayî ye, lewma em wek Hizba Demokrat piştgirî û palderê tevgerê ne. Li Rojhilatê îradeyeke netewî xwe birêxistin kiriye û bêguman em nêzî asoya serkevtinê dibin. Em vê serketinê bi yekîtî û yekdengiya gelên bindest û azadîxwaz ên Îranê di asteke berfirehtir de nîşan didin. Di dawiyê de ez silavan dişînim bo keçên leheng û jinên pêşeng ên tevgera Jînayê û hemû tex û qatên civaka Kurdistan û Îranê. Em bejn û serê xwe li hember malbatên serbilind ên şehîdên şoreşa Jînayê û hemû şehîdên rêya azadî û rizgariya Kurdistanê ditewînin.

Em dev ji vê xebatê bernadin heta serkevtinê

## "Xalid Ezîzî: "Bo gihîştin bi rêkevtin û encamekê, hewce ye ku hemû li ser xalên hevpar diyalogê bikin

Roja Yekşemî 26ê Xermanana 1402 a Rojî, kombûneke siyasî bo Berdevkê Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê "Xalid Ezîzî" li bajarê Waşîngtonê bi rê ve çû.

Li yekemîn salvegera şehîdkirina "Jîna Emînî" û 31emîn salvegera şehîdkirina Dr. "Sadiq Şerefkendî" û hevrêyên wî, kombûneke siyasî bo hejmarek ji kesayetî û nûnerên hizb û aliyên siyasî yên Îranê li bajarê Waşîngtonê bi rê ve çû. Di vê kombûnê de, "Xalid Ezîzî" dûredîmena siyasetên Hizba Demokrat bo hevpêwendiyeke berfireh bi hûrî şirove kir.

Di vê kombûnê de, Berdevkê Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê "Xalid Ezîzî" di axavtinên xwe de bal xiste ser guherinkariyên vê dawiyê yên Kurdistan û Îranê û bi taybet deverê, got: "Bo gihîştin bi rêkevtin û encamekê, hewce ye ku hemû li ser xalên hevpar diyalogê bikin".

Berdevkê Hizba Demokrat behsa platform û bernameya siyasî ya Hizba Demokrat kir ku bo avakirina bereyek berfireh li navbera wan hizb û rêkxirawên siyasî û kesayetiyên xwedî bandor ku bawerî bi azadî û demokrasî û ploralîzmê li Îranê hene, bo



vê armancê jî hewce ye ku bigihîjin bi encameke dilxwaz ku daxwaziya piraniya xelkê Îranê be û bi vê rêyê ve em bikarin bo Komara Îslamî ya Îranê, alternatîvekê çê bikin.

Xalid Ezîzî di beşeke din a axavtinên xwe de îşare bi gefxwarinên rejîma Îranê kir ku bi sedema bêçaretiyê û bo xapandina hizra giştî ya xelkê Îranê ye da ku wisa bide nîşandan ku li derveyî Îranê û bi taybet li Kurdistanê, gefek li ser yekparçeyiya Îranê heye.

Herwisa navbirî tevî berteknîşandan bi vê gotinê, daxwaz kir ku bi wekhevî û hevpêwendî û bi diyalogê, li hember wan gefxwarinên rejîma Îranê bisekinin.

# Kurd û xebat binbir nabe



**Nûredîn Sofîzade**



Hin caran di pêvajoya xebatê de rewşekî nexwaştî û dijwar tê pêş ku heya qasekî bê hivîtî bi dû xwe de tîne û dibe sedema nîgeranî û dilequtkê hem bo xelkê û hem bo parek ji xebatkaran jî.

Xebatkar û mirovên şoreşvan ên kurd ku di pêxema bidestveanîna maf û azadiya netewî û qedera xwe de rêya xebatê hilbijartine, bê guman bi agahî û zanebûn ve bûne şoreşvan, ger kesek jî ku bi agehî û zanebûn rêbazek girtibe bera xwe bi bawer û îman bi berheqiya vê rêbazê ye ku amade ye ked û îza û nirxê li vê rêk de jî bide. Ku wisaye berî heçî kesê mirovê şoreşvan ku xwedî baver û îrada berxwedanê ye, nabe tu carî li xonaxên dijwar ên xebatê de bê hivî be û bikeve dilequtkê.

Mirovê şoreşvan ê Kurd ku xebatê dike bona bidestveanîna mafê netewî, ku bi pêşmergê Kurdistanê tê naskirin, bona geheştina bi armancên bilinde xebatê ku armancên netewîn e, amade ye ku mezintirîn sermayê jiyana xwe an ko canê xwe jî li vê pêxemê de gorî bike. Ger xelkê asayî baş ji vê pirsê tênegîje û tenê bona xoşvaniya pêşmerge û berdewamiya xebatê li qonaxên dijwar de nîgeran dibe, dîsan ewa pêşmerge û şoreşvan in dibe îrade bexş bin û xelkê ji nîgeranî û bêhivtiyê derxînin.

Şoreş û xebata gelê me bi dirêjahiya dîrokê evraz û nişîvên cuda cuda bi xwe ve dîtine, gelek caran kevtiye, lê gelek nekêşaye dîsan rabûye, gelek caran serkevtinên mezin û şanazî bo gelê xwe tomar kirine, mirovê şoreşvan ne li dema şikestê de bê hivî debe, ne dema serkevtinê de serxwe diçe.

Ger em basê xebata netewî li Rojhilatê Kurdistanê bikin, ev 8 dehike ku bi pêşengî û rêberiya Hizba Demokrat ev xebat berdewam bûye û ger hin caran kevtiye, lê aliyê kêm tu caran nehêlaye ku dujmin bigehe xwezya xwe ku bo hertim şoreş û dengê rizgarîxwaziya Kurd mat bibe. Ceribandina 80 sal xebata gelê kurd û Hizba Demokrat û berxwedaniya heya îro rojê ku hatiye kirin, bo me ev wane û derseye ku em erxayînin ji vê yekê ku her çavan Hizba Demokrat gelek roj û qonaxên dijvar bohorandine, dê îro rojê jî her wisa serbilind bi derbasbûn ji vê qonaxa dijvar, bi xebat û berxwedanî û pêşengiya xwe bibe cihê şanaziya gelê xwe û xwediyê hemen pêgeh û hitbar û xoşvaniya xwe be û ci hêz û aliyek û deshilat û dewletek û dujminek nikare rolê pêşengatiya Hizba Demokrat li îran û kurdistanê de berçav negire.

Îro rojê bi pîlangêriya rejîma dijî mirove axundî ku givaşekî zêdeye herêmî li ser Hizba Demokrat û xebata kurd li Rojhilatê Kurdistanê heye, û rejîm jî zêdetir wekî şerê pirûpagendeyî û derûnî mifahê jê verdigre ji bona bê hivîtiya gelê me, bê guma ne tenê ev yêkejî nîşana lewazî û bê hêziya PDKÎ nine, belkî nîşana bi hêzî û xwedî bandorî û pêgeha mezin û bê rikebere Hizba Demokrate ku rejîm jê tirsandiye û sernixûniya xwe li xebat û hebûna Hizba Demokrat û gelê Kurd de dibîne.

Rejîma Komara Îslamî û hemî neyarên Hizba Demokrat gelek baş dizanin ku bi jinavçûna Komara Kurdistanê ev Hizbe ji nav neçû.

Bi sêdaredana Pêşawa Qazî Mihemed û rêberên Komarê û Hizbê, ev hizbe ocaxkor nebû.
Bi şehîdbûna piraniya xebatkar û endamên rêberiya vê Hizbê di xebata çekdariye salên 46 û 47ê de ev Hizbe ji nav neçû.

Bi fermana Kurdqirana Xumeynî di sala 58ê de gelê Kurd û Hizba wan her man.

Bi teror û şehîdkirina rêberê mezin Dr. Qasimlo ku rejîmê xewna temirandina yêkcariye agirê xebatê didît, ev Hizbe her ma.

Bi terora Dr. Şerefkendî ev hizbe her ma.

Bi bombaran û mûşekbaran û bi terora sedandan kadr û pêşmerge û endamên rêberiyê, ev hizbe her ma.

Bi dayêxistina Radio Dengê Kurdistanê, bi givaşan, bi guherîna dehan cihên bargeh û meqerên, ev hizbe her berdewam bûye, li ber evê ku Hizba Demokrat û pêşmerge û endamên vê îman bi xebat û armanc û rêbaza xwe hene, lewra hertim cihê hivya gel bûne û gel zaniye ku Hizba Demokrat sozdarê gelê xwe ye û nirx çi dibe bila bibe lê tu carî gel bê hivî nake.

Bê guman serkevtin ya gelê me û Hizba wane

# Şerefkendî- Rêberek neteweparêz û berdewamkerê rêya Qasimlo



N: Elî Munezemî





Di serdema piştî xilasbûna şerê sar ê di navbera welatên lîbralî û sosîyalîstî de, derket ku netû yek ji wan nikarîbû nasîyonalîzmê ji holê biqedîne.

Ji ber ku eger lîbralîzm bibû sedemê pêşveçûnê aştî û tebahî û azadîyê, lê ew merivên ku di wan civakan de dijîyan, tenê cehd dikirin bo têrkirina nefs û heza xwe û li ber nebûna armancek bilind û îdeal di jîyanê de, nerazî bûn. Ewa jî dibû sedem ku tak ji pey armancên bilind bikeve û hez bike ku bo realîzekirina wan armancan fîdakariyê bike û bi wê fîdakariyê, ji xwe re keramet û rêzdariyê qazanc bike.

Herwiha, di civakên sosîyalîstî de jî, dadperweriya civakî jî eger karîbû nan û îmkanatên madî pêşkêşî xelkê bike û sîstema sosiyal demokrasiyê pêşve bibe, lê nikarîbû ji wan re kiramet û rêzdariyê berhev bike. Herduyê wan sîsteman jî bibûn sedem ku xelk nasnameya xwe wunda bike.

Ew yeka jî bû sedem ku dîsan têkoşîn bo nasname û kirametê di cîhanê de serî hilde.

Têkoşîna Kurdan a ji bo azadiyê û armancên wan ên netewî gelek beriya şerê sar dest pê kiribû, di serdema wî şerî de jî berdewam dikir, û hê jî berdewam e. Lê aliyên çepên kurd û yên ser bi neteweyên dagîrker ên Kurdistanê wê serdemê bi partî û aliyên neteweparêzên kurd re digotin paşvero û kevneparêz. Ji ber ku wan berevanî ji maf û azadiya netewa xwe dikir. Piştî dawîpêhatina şerê sar, ku derket nasname bi giştî û nasnameya netewî bi xasmanî li aliyê ekterên meydana siyaseta navneteweyî yên herdu aliyên çep û lîberal, ji holê nehatibû rakirin. Dr. Şerefkendî li ser rastiya xebata netewî û azadîxwazane ya netewî axaftinek di kongireya 9an a PKDÎ de pêşkêş kir ku rastiya wan gotinan di teoriyên nûjen de meriv dikare îro rojê bibîne.

Her neteweyek dikare hest bi wê hindê bike ku kirameta wê ji aliyê xelkên din ve hatiye şikandin yan hûrmet jê re nehatiye danîn. Li cem neteweyek hanekî, nasîyonalîzmeke hêrs çê dibe. Xebata netewî jî ku Dr. Şerefkendî beh jê dike, ji ber şikandina kirametê ye ku cehd dike û dixwaze hawirdor û cihava navnetewî mecbûr bike bi rêzdarî di hember de tev bigerin. Şerefkendî bi têgihîştin û famkirina wî heste hevpar, cehd dikir ku kurdan li ser rêya xebata netewî û azadîxwazane biherikîne û mobîlîze bike. Ew têkoşana Dr. Şerefkendî rêberiya wî dikir û dixwast kurd jî li ser wê xebatê berdewam bin, her ew têkoşana bû ku «Hêgêl» bi têkoşan bo danpêdanînê nav dibe û bi berçavgirtina hêza dîroka merivahiyê dihesibîne. Ew hêza han di çêbûna cîhana nûjen de girîngiyek xasmanî heye. Ji ber ku Dr. Şerefkendî baş dizanî ku eger pirsa nadedperweriyê bi pirsa kirameta neteweyî û azadîxwazîyê ve were girêdan, bihêztir yê di hember dijminan de berxwedanê bike.

Şerefkendî bi xebat û baverî û şiroveyên xwe dida zelalkirin ku gelê kurd hind layiq û kêrhatîye ku bikare bi xwe jîyan û çarenivîsa xwe destnîşan bike. Li ber ku merivê kurd jî merivên xwedî hizr û ramanên xwe ne bo jîyanê û hazir nîn in ku tevger û reftara xelkê din kopî bikin. Bo Şerefkendî jîyan bi rengê kurdî, goreyî nirx, adet û kevneşopîyên kurdî cîyê şanazî û serbilindîyê bû. Ewî digot ku merivahî li civakên cihêreng pêk hatîye ku her yek li wan civakan xwedê taybetmendîyên xwe yên xasmanî e; welatê xwe, zimanê xwe, adetên xwe û … heye ku baş yan xirab dilê wan pê xweş e. Ew gotinên Şerefkendî didin eyankirin ku kurd di bin destê dagîrkeran de xwe xerîb hîs dikin û yê tenê hingê derûna wan aram be ku nasnamea yan bi fermî were naskirin.

Şerefkendî di heyamê kurt yê rêberîya xwe de da eyankirin ku tenê ew rêberk jîr nebû; lê belê ew rêberek xwedî exlaq bû. Li ber ku kesên jîr tenê li pey berjevendî û qazancê xwe û têrkirina nefsa xwe ve ne. Lê kesên xwedî exlaq hilbiratinên xwe li ser bingeha nirx û qîmetan dikin.

Şerefkendî rêberek xwedî keramet bû. Ewî jî wek dr. Qasimlo xebat dikir ku cîhan bo kurdan bibe cîyek tijî xêr û xweşî bo jîyanê. Li ber ku dijminan kurd zelûl û hûstûxwar kiribûn. Bes xebat bo azadîyê, berteka hember wê bêexlaqîya dijmin bû. Xebata dr. Şerefkendî tenê bo kerameta netewî û parastina nirxên netewî nebû. Ewî herwisa bo kerameta takekesî jî xebat dikir. Li berk u bo Şerefkendî jî, civakek xwedî keramet li taken xwedî keramet pêk dihat. Lewra bo wî azadîya netewî li azadîya takekesî cihê nebû. Her çawa azadîya netewî ne ya şikandinê bû, nedibû ku azaîyên takekesî jî werin şikandin.

Şerefkendî jî wek Qasimlo kultûra rêkxistîn di PDKÎ'ê de li ser bingeha nirx û buhayên exlaqî û azadîxwazane pêş xist. Ewî endamên hizbê wisa perwerdekirin ku ew li pêş hemû tiştekê de dilsozê welat, netewe û kultûra xwe bin. Ewî endamên PDKÎ'ê herwisa perwerde kirin ku li ber kurdbûnê ku xwediyê kultûr û ziman û welatek dewlemend in, bi xwe şanaz û serbilind bin.

Em jî wek endamên PDKÎ'ê wan nirx, ders û şîretên Şerefkendî jibîr nakin û emê her tim bi rêbaz, armanca wan û kurdbûna xwe li gor nirx û buhayên wî destnîşankirinî şanaz û serfiraz bin.

Di 31.minî salvegera şehîdbûna Şerefkendî û hevalên wî de, em nav û bîranîna wan bilind radigrin û bejna xwe li hember mezinahîya wan de ditevîn in.

# Anferim Ronaldo







**N: Serbest Urmiye**

Di demekê de ku netenê civaka Îranê, belkî civaka navneteweyî jî li bendê bû ku di salvegera şehîdbûna keça Kurd Jîna Emînî de ku bû destpêka şoreşa berfireh a "Jin, Jiyan, Azadî"yê, rojeva Îranê şahîde serhildaneke berfireh li dijî rejîma Îslamî ya Îranê, bi taybetî di navenda welat de be, lê belê bervajî derket. Rêkxistin yan birêveçûna pêşbirkeya fotbolê di navbera taqima Pirspolîs a Tehranê û El-Nesir a Erebistana Siûdî ku stêrkê cîhana fotbolê, wate Ronaldo, bi xwe re anîbûn Tehranê, ji bilî kêmasiyên fotbolê di Îranê de , lome û gazindeyên cidî ji ber riftar û terzê nerênî yê pêşwaziya xelkê Tehranê û berpirsiyarên werzişê yên rejîmê, rû bi rûyê xelkê kirin.

Nirxandin û şiroveya hatina Ronaldo di qada fotbolê de, ne armanca me ye di vê gotarê de, belkû derfeta şiroveyê dispêrin pispor û şehrezayên werziş û warê taybetî yê fotbolê. Di vir de hewil tê dayîn ku şêweya ber bi rû bûna xelkê û riftarên wan yê ne şaristanî di pêşwaziya Ronaldo, ew sitêrkê bi nav û deng ê cîhana fotbolê de, bê şirove kirin.

Ya ku di pêşwaziya berpirsiyarên werzişa rejîmê de hatî dîtin ji Ronaldo û taqima El-Nesir, bêrûmet bûna rejîma Îranê da xuyakirin. Ji ber ku Ronaldo bi şêwazekê ji cil û bergan di axa Îranê de peya bû ku li gor yasayên Îranê qedexe ye. Bêguman ew ber naşarezayiya wî nahê zanîn, çunkû nabe ku Ronaldo weke sitêrkeke cîhanî, ji yasayên welatan haydar nebe yan nehê haydar kirin. Lê desteya pêşwaziya rejimê ev yek mêze nekirin.

Ronaldo di demekê de ku diyariya Riza Derwîş, berpirsê yaneya Pirspolîsê wergirt, dîsan sîstema rejîmê ber bi rûye gazindeyên şirovekaran kir. Bi terzekê ku riftara Ronaldo di vê demê de dûr ji tîtalên werzişî dane zanîn. Her wiha berpirsê yaneya Pirspolîsê jî hate lome kirin. Di wê derheqê de Mihemmed Cewad Xiyabanî, pêşkeşkar û sitêrkê ware mediyaya werzisê anî ziman ku pêşwaziya berpirsên werzişa rejîmê dûr ji hemû protokolên yasayî bûn.

Ya ku zêdetir rûyê berpirsên rejîmê reş kir, dizîna kirasekî Ronaldo bû ku wajo kiribû û bi diyarî dabû keça hunermend a melûl bi nave Fatime Hemamî. Heta dema nivîsîna gotarê de jî malbata hunermenda han ragihandin ku ew kiras berpirsên Pirspolîsê nedayne me. Di vê derheqê de Muselî Alê Nasir, berpirsê yaneya El – Nesir, da xuya kirin ku me di dema bihîstina nûçeya han de bi balyozê Erebistanê re xeber daye û biriyar e ku Ronaldo kiraseke din di rêya balyozxaneya Erebistanê ve ji hunermenda han re bişîne.

Di derheq pêşwaziya xelkê de, gotina bi nav û bang a "François Voltaire" yê Firansayî, belgeyên zindî tîne ber çavên mirov ku dibêje:" Pir zehmet e azadkirina wan kesan ku biriyar dane zincîrên êxsîriyê îbadet bikin".
Haina taqima El-Nesir a Erebistanê û Ronaldo bo Tehranê, ev yek di derheq civaka navednî ya tawavîxwaz a Îranê de da selimandin. Gelo dibe têgihîştina şêniya ku li pey tirombêla veguhastina Ronaldo de direviyan, ji azadiyê û jiyana azad çawa be? Ew jî di demekê de ku ew îmkanên rejîmê ji Ronaldo û taqima wî re dabîn kiribûn, ji şêniya pey wan ketî re xevin û xeyal in.

Rejîma Îranê ji bo ku nifûsa alîgirê fotbolê û sitêrken fotbolê di Îranê de bêrûmet bike, tu îmkanek dabîn nekiribû ku nifûsa han bikare bi terzeke şaristanî hêviya dîtina sitêrkekê hez jê kiriyê xwe bi dilekî xweş di bîrewериyên xwe de tomar bikin. Eva di demekê de ye ku weke hemû welatên din dikarîn di navbera rêya balafirgehê heya hotela diyarî kirî de, di çend cihan de îmkana dîtina nêzîk a Ronaldo û welatiyên xwe yên alîgirê wî re destnîşan kiriban. Ya ku berê di welatên weke Japon, Çîn û … hate dîtin. Ji aliyeke din ve rejîmê heta derfet neda di roja peşbirkê de jî tu kes here nava yaneya Prispolîsê de û aliyê kêm ji nêzîk ve pêşbirkeyê bişopîne.
Tê gotin ku berpisên rejîmê bi hêceta wê çendê ku nekû di hevdembûna salvegera serhildana "Jîna"yê de , şêniya han vê hatinê bikib derfet bo xwenîşandana nerazîbûnê, ev îmkan nedane xelkê. Lê ya rastî be ewa ramaneke sivik tê dîtin, ji ber ku serbarê hest kirin bi vê hemû bêrûmetiyê, dîsan xelkê Tehranê û amadebûyên meydanê aliyê bêdengiyê girtin û dan xuya kirin ku ramaneke wilo di holê de nine da ku biselimîne ku civaka navendî ji têgeha rûmeta mirov û azadiyê fêm kiribin. Helbet ew ramana han di demeke de dikarî bihêz be, heke pêşbirkeya han di bajarekî Kurdistan yan Belûçistanê de meşiya ba.

Riftara civaka navendî bi qasekê nerênî û dûr ji şaristaniyetê hate nirxandin ku kanalên TV'yan yên Erebî û yek ji wan kanala El- Cezîre a Qeterê ev bi hov dane nasandin. Her wiha pêşkeşkarê Siûdî di dema rûmalkirina pêşbirkeyê de, dibêjê dîmenê ku me di Îranê de dîtin, mirov bo 30 salan paşve verdigerînin.

Ji bilî ku rejîmê bi qasê hewce civaka navendî ya Îranê bêrûmet kir, di heman demê de jî bû berdevkê xelkê. Bi awayekê ku Riza Derwîş, berpirsê yaneya Pirspolîsê di gotinên xwe dibêje:" min ji Ronaldo re got ku xelkê me ji ber alîgiriya te ji şoreşa Felestînê, wiha ji te hez dikin."

Bê guman dîtina dîmenên han bo Ronaldo bê bandor nebûne ku di dema bi dawîhatina pêşbirkeyê de weke debeke werzişî, di dema ku lîstikwanê taqima Pispolîsê Şehab Zahidî, daxwaza kirasê wî dike, dibêje na.

# Di Bakûrê Kurdistanê de "Tirkiyelîbûn" û "Dewşîrme" wekhev e

**N: Kofîxwar**

Axaftin, xwedîderketin ji zimanê kurdî li nav kurdên Bakur hêdî hêdî kêm dibe. Kurdên Bakur zimanên dagirkerên xwe wek zimanekî modern, rojane, hêsan, li her derê derbasdar dibîne. Ji ber vê pêwîstiya fêrbûna vî zimanî dibînin.

Li gorî kurdên Bakur ji dibistana seretayî bigir heta zanîngehan, ji kar û barên dewletê bigir heta danûstandinê kîjan ziman hewce be divê ew ziman bê zanîn. Ya din naxwazin zarokên wan bi zimanê kurdî ve kurdiya xwe eşkere bikin û jenosîda pergala serwer ve her roj rû bi rû bimînin. Lewma pirraniyên dê û bavan êdî di mala xwe de ne zimanê kurdî, zêdetir bi zimanê tirkî diaxivin. Lê nizanin her çi bikin dîsa sîstema desthilatdarî dîsa hebûna wan bona pêşaroja xwe metirsiyek mezin dibîne, wê tu carî jî xwe û kurdan wekhev nebîne.

Helbet ew helwesta nexweş li nav kurdên Bakur ji nişkê ve derneketiye holê. Bingehina wê dibe ku hezar sal e di her perçeyên dagêrkirî de hatiye avakirin. Lê em ê kêm û zêde qala sed salê li Bakurê Kurdistanê tê kirin bikin. Êdî her kes dizane û dipejirîne ku pergala dewleta Tirkiyê li ser tunehesibandina neteweyan, kêmneteweyan e. Maqezagon, çand, siyaset, perwerdehî, her cûre sazî li gorî vê hişmendiya serwer şêwegirtiye. Partiya İttihat û Terakkî, Mustafa Kemal û rêhevalên wî li pey jenosîda 1915an dor bi dor, roj bi roj dagirî welatê kurdan kirine. Jenosîdeka pir alî li ser kurdan domandine; hebûna kurdan, zimanê kurdan, çand û dîroka kurdan tine hesibandine. Kurd hirç, hovanê, paşverû nîşan dane.

Hema hema wek nêçîrekî li pey kurdan ketine. Bi her awayî dest bi jiholêrakirina kurdan kirine. Hebûna kurdan ya ku 12 hezar sal in li ser axa xwe ne di şevekê de bi xêzeka penûsê ve, bi maqezagonekê ve tune kirine. Bi zimanekî çêker ve, netetweya tirk derxistine li pêş civakê. Civaka ku bi zorê darê li hev anîne. Bi her awayî pesnên zimanê tirkî, tirkbûnê dane. Hemû navên gund û bajaran guhertine, navên tirkî, navên eletewş lê kirine. Bi Jenosîdeka pir alî ve bi hincetên beredayî ve bi hezaran kurd kuştine, zext û zordarî yên mayî kirine.




Piştî ewqas serhildan û komkujiyan (Koçgîrî, Şêx Saîd, Dêrsîm, Zîlan û hwd) li Kurdistanê cih dibin, êdî navê Kurdistanê hilnedane, Kurdistan wek rojhilata tirkiyê bi nav kirine. Komarê paşê bi ertêş, ziman û dibistanên xwe ve dest bi metingeriyê kiriye. Dagirî û metingeriya xwe jî wek ya Ewropayiyan ya ku parzemîna Afrîqayiya dagîrkirî ditîne.
Mêtingeriya Bakurê Kurdistanê bi vî awayî li ber çavên raya giştî normalîze kiriye. Ewropî dagîrkirina Afrîqayê îro rojê qebûl dikin, lê Tirkiye ti carî dagîrkirina Kurdistanê, mêtingeriya Kurdistanê ne bi fermî ne jî devkî napejirîne. Ne Kurdan ne Kurdistanê di belgeyên dewletê de nîşan nade.

Wê heta dewleta wan hebe jî nadin. Dewletê ji avakirina komarê vir ve, ango sed sal li ser kurdan şer û jenosîdên piralî domandiye. Ger kurd ji holê rakirine, ger ji dûrî Kurdistanê xistine. Ji aliyekî jî li Kurdistanê li ser axa kurdan, bi sedan rêbazan ve dest bi dewşîrmebûna kurdan kirine, mixabin hê jî dikin. Kurd her roj bi vê jenosîdê ve rû bi rû mane. Bi taybet li van sal in dawîn zêdetir dixwazin kurdan ji eslê xwe dûr bixin, bikin "tirkçî"; herkesî pirtir nimûneyên tirkbûnê ve nijadperstiya tirkçîbûnê bikin.

Mixabin roja îroyîn gelek kurd ala tirkan û wêneyên Ataturk didin dest zarokên xwe di rojên cejnên fermî de û kolan bi kolan digerînin. Di mala xwe de jî kurdî axaftin qedexe dikin. Keç û xortên xwe bi tirkan re dizewîcînin. Jinên malan ji sibê heta êvarê li TVyên tirkî temaşe dikin, hişmendiya serwer ya li dijî kurdan fêr dibin. Di bandora rêzefilmên ku di welatê kurdan de derbas dibin; kurdan wek hovan, paşverû û çand, zimanê kurdan jî bêfeyde nîşan didin, dimînin. Ji Kurdbûnê, kurdistanîbûnê dûr dikevin û tirkîze dibin.

Sedemeka din ya ku kurd xwe sîstemê ve girê dide, nirxên civaka serwer, nîşaneyên neteweya serwer wek ya xwe dibînin polîtikaya PKKê ya dawîn e. Piştî şerê PKKê-dewleta serwer bi milyonan kurd ji welatên xwe dûr xistine, di bajarên Tirkan de li nav wan cihwar bûne. Dawiya vê koçbûnê, dawiya polîtîkaya "Tirkiyelîbûnê" gelek kurd xwe wek "Tirkiyelî" pênase dikin û hêdî hêdî "devşîrme" dibin. Di bandora dîndar û çepgirên Tirkan de, bi wan herdu rêyan ve ji dûrî Kurdistanîbûn û kurdbûnê bûne. Bi ser de dijminatiya kurdên ku xweyî ax, çand û zimanê xwe ne dikin. li dijî wan şerekî civakî, derûnî didomînin. Naxwazin tu kes, koka wan bê bîra wan. Herçiqas entegreyê sîstemê dibin ewqasî xweyî Ataturk, al û çanda wan a di wir de wê de berhevkirî û ya hatî dizîn derdikevin.

Kesayetiya kurdan tê guhertin, derûniya wan xirab dibe, kesên eletewş, bêfeyde, dijminê însanên xwe derdikevine holê. Ne tirk hebûna wan dipejirîne, ne jî kurd. Dibin devşîrmeyên encama projeya sîstema serwer. Ew êdî ne tirk in û ne kurd in. Ew devşîrmena hişmendiya "Tirkiyelîbûnê" ku pirtir li nav kurdên bajarî cih girtiye qebûl dikin. Wan têkiliya ziman, çand, sembol û dagîrkirinê ji hev qedandine. Ataturk û Kemalîzmê sedemên jenosîda kurdan nabînin, sûcdar nakin û li hemberî kurdan bêtawan dibînin û xwe aîdî dewlet û hişmendiya serweriyê dikin.

Roja îroyîn kurdên Bakurê Kurdistanê li nav lepên nijadperstên mongol û hişmendiya kemalîzmê ne. Bêxwedî, bê ser û bê hişmendî wek morikên belavbûyî ne. Rêxistineka Kurdistanê nîne.

Diyaspore jî, yên xwende jî wisa ne. Wan rojan jî hinek nîvîskar bêhtir meyla xwe dane li ser tirkînivîsê. Xwedîgiravî gelek kurd kurdîxwendin nînin, lewma dixwazin gelek kurd nivîsên wan fêm bikin ji ber wê tirkî dinivîsin. Wekî her cara dibêjin û dubare dikin, pêwist e û divê kurd haya dîroka xwe bibe, fêrî kurdînivîs, kurdîxwendinê bibe. Li dijî sîyaseta desthilatdarî ya ku kurdan tine dihesibîne, xwe zana bikin, sîyaseta xwe ya Kurdistanî ava bikin. Her dem zimanê xwe biaxivin, fêrî zarokên xwe bikin. Dîplomasîyeka xurt çê bikin, haya dinyayê li kurdan, jenosîda kurdan û hwd hebe. Tim û tim bixebitin. Wekî din wê hêdî hêdî ji holê bêne rakirin.

## Nerîna Lîderan



**“Benjamin Netanyahu”:**

**“Divê rejîma Îranê rûbirûyê gefeke leşkerî ya giran bibe”.**




**“Alexos Grinkevich”:**

**“Rûsya dronên Îranê nûjen dike û dibe ku ev teknolojiye vegere Îranê û dironên Îranê metirsiyek micid e li ser ewlehiya navçeyê”.**



**Enrique Mora:**

**“Girîng nîne ev rêkevtine navê vê Bercam e yan “baştirîn rêkevtin”, lê ti alternatîvek ji bo Bercamê nîne”.**



**“Mihemed Bin Selman”:**

**“Eger rejîma Îranê çeka navkî bi dest bîne, divê me jî çeka navkî hebe”.**

# Serkomarê rêjîmê, lat lûtan ji bo qedandina serhildana Jînayê bi kar tîne!



**N: Eskender Ceiferî**

Ji havîna derbasbûyî ve, piştî ku serhildana Jînayê li Kurdistanê destpê kir û pişt re gihaye Îranê, rêjîmê nekariye vê serhildanê kontrol bike. Niha jî rêjîma dagîrkar a Tehranê, ji bo ku bikare şoreşê kontrol bike, lat û lûtan bi kar tîne.
Piştî ku Îbrahîm Reyîsî serkomarê nû yê rêjîmê, ew jî di rêbaza çewt a bikaranîna lat û lûtan de berdewam e. Niha Reyîsî biryar standiye ku Sipaha faşîstên Tehranê, ji bo ku bikare serhildanê biqedîne, lat û lûtan rêkxistinî bike. Pere bide wan û ew jî li pêşiya xelkê serhildêr derkevin.

Ev jî di demekê de ye ku hin kesan, ji bo ku xelkê bixapînin digotin deng bidin Reyîsî ewê mafên we bide we.

Di van 44 salan de her ji dema propagendeyên hilbijartinan ve heya hatina serokkomarekî din ê rêjîmê, lat û lût, tim ji aliyê rêjîmê ve ji bo tepisandina xelkê hatine bikaranîn.
Ji bilî vê, di van 44 salan de tepisandina neteweyên nefars jî her berdewam dike.
Ji sala 1979’an ve heya niha 12 gerrên hilbijartinên serokkomariyê û hilbijartinên din li Îranê hatine encamdan. Di ti yek ji wan de ti Kurdekî nekarî bibe berendamê rastîn ê gelê xwe.
Di 11 gerran de heft kes weke serokkomar hatibûn hilbijartin. Helbet desthilata wan sînordar e û nikarin tiştekê bêjin ku li gora heza Elî Xamineyî rêberê Komara Îslamî nebe.
Lê ya rast ev e ku ji bo Kurdan ferqê nake kîjan hilbijartin be. Ew di bin siya partiyên xwe de, tim di van salan de hilbijartinan baykot dikin.
Di salên di navbera 1979’an de heya 1981’an du kes bi navên Ebulhesen Benîsedr û Mihemedelî Recayî serokkomar bûn. Lê serokkomariya herduyan jî netemam ma.
Sala 1981’an take sal bû ku du caran li wî welatî hilbijartinên serokkomariyê hatin encamdan. Sedem jî kuştina Mihemedelî Recayî bû ku tenê kêmtirî mehekê di wê postê de bû.
Piştî kuştina Recayî, Elî Xamineyî, Ekber Haşimî Refsencanî, seyîd Mihemed Xatemî û Mehmûd Ehmedînijad her yek du salan serokkomar bûn. Hesen Rûhanî jî piştî wan hat û piştî wî, Îbrahîm Reyîsî hat. Tevî ku serokkomar li wî welatî piştî bidawîhatina dema çar salên xwe, car din bi hikûmetê re dimîne, lê Refsencanî û Ehmedînijad du ji wan kesan bûn ku piştî çend salan car din xwastin bibin namzed lê selahiyeta wan hate redkirin.
Di hilbijarinên sala 2009’an de zêdetirîn asta beşdariya xelkê ji aliyê wezareta Navxwe ve hatiye tomarkirin. Mehmûd Ehmedînijad wê demê karîbû tundrewan bikşîne aliyê xwe ve. Mîrhusên Mûsewî jî ku reformxwaz bû, karîbû bi hildana sloganên demokrasiya rejîmê, gelek dengan bi dest xwe ve bîne. Lê pişt re wezareta Navxwe ragihand ku navê Ehmedînijad car din ji sindûqan derketiye. Di wan hilbijartinan de zêdetirî 39 milyon û 400 hezar kesan deng dan ku dike 84 ji sedî kesên ku mafên dengdanê hebûn.

Di van 38 salan de gerra duyem ya serkeftina Refsencanî, xwediya kêmtirîn asta beşdariya xelkê di proseya dengdanê de bû. Di wan hilbijartinan de hinek zêdetirî 50 ji sedî kesên ku dikarîn deng bidin, dengên xwe bikar anîn.

Di destpêka avakirina Komara Îslamî de di yekemîn gerra hilbijartinan de 124 kesan navên xwe weke berendam tomar kirin ku piştî dayîna selahiyetan û vekişîna hin berendaman, 96 kesan hevrikî kir. Di hilbijartina herî dawî ya 2017’an de 1636 kesan navên xwe ji bo wergirtina selahiyetê tomar kirin lê di encam de tenê selahiyet ji 6 kesan re hate dayîn.
Gelek kesan tevî ku pêgeheke baş di nava xelkê de hebûn, lê nekarîn selahiyetê bistînin. Yek ji wan ku heya niha jî çarenivîsa wî nayê zanîn, Mesûd Recewî rêberê rêxistina Mucahidîn li Tehranê bû. Wî deng neda yasaya bingehîn û ji ber vê, Rûhulla Xumeynî got ew kafir e. Xumeynî li ser serkirdeyên Kurdan weke Dr. Ebdulrehman Qasimlû jî heman tişt got tevî ku di civaka Kurdistanê de xwediyê pêgeheke bilind bû.
Ebulhesen Benîsedir jî ku 78 ji sedî dengan bi dest xistibûn, ji aliyê parlamentoyê ve di bin givaşên Xumeynî de hate dûrxistin û niha li Fransayê ye. Tevî ku Benîsedr di şerê lidijî Kurdan de li pişta Xumeynî bû, lê di şerê Îran û Îraqê de pişta Xumeynî negirt û ev jî bû sedema dûrxistina wî ji posta serokkomariyê.
Sadiq Qutbzade ku wezîrê derve bû bi tometa hewldan ji bo derbeya leşkerî hate darvekirin. Daryûş Firûher wezîrê Kar û Karûbarên Civakî bû, hate kuştin. Herduyan jî dixwast bibin berendamên serokkomariya Îranê.
Mîrhusên Mûsewî û Mehdî Kerûbî jî ku di hilbijartinên sala 2009’an de berendam bûn û beriya wê jî çend postên bilind di hikûmetê de hebûn, nekarîn bi ser Ehmedînijad de serkevin. Mûsewî û Kerûbî nerazîbûna xwe ji encamên dengan anîn ziman û alîgirên wan derketin kolanan û xwepêşandan kirin. Tevlîhevî çê bûn û ji wê demê ve ew di malên xwe de girtî ne.

Taybetmendiyeke hevpar a hemû serokkomarên rêjîmê jî ew e ku lat û lûtan ji bo tepeserkirina xelkê bikar tînin. Niha jî dîsa serokkomarekî din ê rêjîma faşîstên Tehranê, ji bo kontrolkirina serhildanê, lat û lûtan bi kar tîne. Lê vê carê pir ciyawaz e ji ber ku tevahiya neteweyan li fijî vê rêjîma gemar rabûne ser piyan.

# Asoyên Serhildana Siwêdê



N: Ebdulazîz Qasim



Wekî herkes dizanî ku Sûriya her ji sala 2011an ve û heta niha di qeyranek siyasî û mirovî ya xirab de derbas dibe, ku bi egera wê niha Sûriya ketiye di gelek qeyran û astengiyên mezin de, bi taybetî qeyrana aborî û bargiraniya wê li ser jiyana xelkê Sûriyê bi giştî û bi awayekî taybet li ser jiyara xelkê deverên di bin kontrola rêjîmê de, ku li vê dawiyê rewşa aborî bi carekî têkçûye digel bilindbûna nirxê dolar li hember lêreya Sûrî, bi awayekî dikarin bêjin ku xwepêşandanên vê dawiyê li hindek navçeyên Sûriyê bi taybetî li Siwêda wekî bersivdanek li ser biryara rêjîmê hatin, ew biryara di 16'ê Tebaxê de ji aliyê hikûmetê hatî pejirandin, bi bilindkirina nirxê kelûpelên xwarinê û nirxê sûtemeniyê bi rêja 200% î, li hember zêdekirina mûçeyan 100%, ku ev biryar bû sedemê nerazîbûna xelkê Sûriyê bi taybetî li deverên di bin kontrola rêjîmê de, ku hinek xwepêşandanên girsayî li vê dawiyê li çend parêzgehên Sûriyê hatin lidarxistin, bi taybetî li Parêzgeha Siwêda, Navenda serekî ya (Dirziyên Sûriyê) ku ev nêzîkî heyvekî heye, xwepêşandên girsayî bi awayekî rojane li vê parêzehê li başûrê Sûriyê têne lidarxistin, bi bilindkirina alayên Dirziyan û sloganên li dijî rêjîma Şamê, ku serhildana xelkê Siwêda bi qonaxeke nû li gorî hindek çavdêrên siyasî tê bi navûnîşan kirin, nemaze ku xelkê Siwêda her ji dûzde salan ve bi awayekî giştî tevlî xwepêşandanên li dijî rêjîma Şamê nebûne, bi sedema dirûşm û sloganên îslamî û mezhebî yên vê (şoreşê), herwisa bi dîtina min bi sedema nakokiyên mezin yên civakî û olî di navbera Dirzîyan û xelkê parêzgeha Dera û eşîretên (Bedû) yên ereban de, ku car car ji aliyê eşîretên ereban yên (Bedû) û rêxistina DAIŞ ya terorîst ve, hinek êrîş û kiryarên kuştin, revandin, talan û diziyê li dijî xelkê Siwêda hatine pêkanîn.

Rêber û rûspiyên olî û civakî yên Dirziyan, di heyamê dûzde salên borî de, bi hestyarî û berpirsyariyek mezin serederî digel qeyeana Sûriyê kirin, dûr ji bazrganiyê li ser doza miletê xwe, berovajî serkirdeyên partiyên kurdî yên Rojavayê Kurdistanê!

Xwepêşandanên Siwêda, tevlî bilindkirina sloganên li dijî rêjîma Şamê û rakirina wêne û peykerên Bişar Esed û Bavê wî li ser sera û avahiyên hikûmetê û li meydan û kolanên Siwêda û daxwaza bicihkirina biryara Encûmena Ewlehiya Neteweyên Yekgirtî 2254, her wisa jî dikarin bêjin ku Serhildana Siwêda hindek taybetmendiyên xwe hene, ji wan bilindkirina Ala Dirziyan ya rengereng û sloganên piştevaniyê bo gelê kurd li Efrîn û Serê Kaniyê, ku ji aliyê xwepêşanderan car sloganên wisa yên dilsoziyê bi Gelê Kurd ji aliyê xwepêşanderên Siwêda ve têne bilindkirin.

Bi dîtina min, ku wê çarenivîsa serhildana xelkê Siwêda ber bi encamên baş biçe ji bo dîtina çareseriyeke erênî bo krîza Sûriyê û herwiha bo dabînkirina mafên neteweyî yên netewe û nijadên cuda cuda yên Sûriyê, ku (Serhildana Siwêda) wê wek (şoreşa Sûriyê) nayê dizîn, ku hîç aliyekî navxweyî wekî (opozîsyona sûrî ya bazirgan) û herwisa her aliyek derekî nikaribe vê berê vê Serhildanê biguherîne ber armancên li dijî berjewendiya Xelkê Sûriyê de, lewra bi dîtina min, ku encamên vê serhildanê dê bi awayekî erênî bikevin di xizmeta tevaya gelê Sûriyê de û bi taybetî di berjewendiya kêmatiyên neteweyî û olî de, dê asoyên baştir peyda bike bo ku Sûriya ber bi dewletekî federal û ne navendî biçe.

Miletê kurd jî dikare wane bigire ji serhildana xelkê Siwêda, nemaze ku têkiliyên dîrokî yên baş hene di navbera Dirzî û Kurdan de, nemaze ku li gorî lêkolînên dîrokî yên hindek dîroknivîs û lêkoleran, ku têkiliyek dîrokî bihêz di navbera Kurd û Dirziyan de heye, her wekî dîroknivîsê kurd Dr. Mehdî Kakayî ku tekeziyê li ser hebûna têkiliyek olî jî di navbera Dirziyan û Kurdên Yarîsanî de dike, tevlî têkiliyên siyasî yên di navbera rêberê Dirziyên Lubnanê Kemal Canpolat (1917-1977) û piraniya Partiyên Kurdî de, ku niha kurê wî rêzdar Welîd Canpolat bi heman awayî têkiliyên xwe yên bihêz ligel piraniya partiyên kurdî û Hikûmeta Herêma Kurdistanê hene û li gorî jêderên dîrokî ku Dirzî yan bi erebî (Dirûz) zêdetir ji hezar salî ji Kurdistanê hatine başûrê Sûriyê, Lubnan, Îsraîl û Jordan (Ordinê), ku piraniya wan li başûrê Sûriyê dijîn bi taybetî li herdû navçeyên Colan (Parêzgeha Qonêtra) û Horanê (Parêzgeha Siwêda), li gor amaran, ku hejmara Dirziyên Sûriyê nêzîkî %3.2 ji xelkê tê texmînkirin, yanî di navbera 700 hezar û 800 hezar kesî de ye, hin çavkaniyên din amaje dikin ku hejmara wan nêzîkî milyonek kes be, ku Parêzgeha Siwêda li serdemê desthilatdariya Fransa li ser Sûriyê xwedî statoyek outonomî serbixwe bû bi navê (Dewleta Cebel Dirûz) ango (Dewleta Çiyayê Dirziyan), ji sala 1921 heta 1936an)).

# Di navbera nimêj û dîlanê de



**N: Vênûs Fayîq**

**W: Hesen Mukerem**



Ji bo vê ku ne bi tenê demekê qut bikim an di gel miroveke demê parve bikim, muzîkê guhdarî bikim, ji bo vê yekê jî ne kareke hunerî ye û hunermend min hebandibe. Guhdariya muzîkê hewce ye, çawan mîdê min vala dibe û bi xwarinê dadigirim, her wisa jî hizra xwe tijî dikim li muzîkê.. Hinek dema jî bi hinek duayan, laş hewcehî bi dîlanê hedibe, lê çi dîlanek? Ev dîlana ku ruh têr dike û li hundirî sirûşta îlahî de wunda dike..

Dîlan, bi wateya bejin û felsefeyek wek vê ku sofî, bi mebesta kipkirina hewesê û xwastên taybet, bi guhdarîkirina li Xweda û muzîkê û tevgeriyana li dewra xwe ku wateya vê wedigere bo tevgeriyana cîhanan li dewra rojê, û pêş û paşê dîlana sofiyan jî, mirovahî bi dîlankirinê nasyarbûne û berfireh kirine..

Nietzsche dibêje: Bi bê muzîk jiyan dibe şaştiyeke mezin ... Sehra muzîkê di vê de ye her çawan avjen xwediyê bejneke zirav û bedeve, û yê ku bi muzîkê re dijî jî xwediyê kesayetiyeke zirav û bedev e.

Her mîna Xwedavenekê ronî bi bê xîç e ku li ser bermalê an di nav mala Xwedê de tenê mejûlî xurtkirina vê peywendiya efsaneyî ye di gel Xweda de, dîlanker jî bi wateya bejin û bê xîça hewldanê ye bo bilindkirina ruh bo cîhaneke bilind ku li hundirî vê de mirov digihîje bi pileya Xwedavendan...

Axir em tevahiya tiştên ku di jiyana xwe de encam didin rêyeke ku pêşiya Xwedayekê radixin, êdî bi muzîkjenînê be an nimêjkirinê an dîlankirinê be, di dawiyê de xwarinê didin bi ruh. Çawan ku nimêjkirin, ruhê duakirin û hebandina Xweda ye, mûzîk jî ruhê gerdûnê ye, van her du baskên ku pê difirin, jiyan li derheq tiştên mirovan de jî peyda dikin..

Dema ku tevahiya laşê te guhdarî muzîkê bike, axwe yê ku dizane muzîk çi tişteke û tenê bo guhên xwe guhdarî nake, tevahiya hizra xwe beşdar dike di xweşîbirin li sehra vê. Êdî dema ku guhdarî hinek muzîkan dikî nikarî laşê xwe nevilvilînî, nikarî hundirî cîhanekê bibî ku dişibe bi cîhana sofiyan.

Ehlam Mistexanmî di yek ji romanên xwe de dibêje: Neku sekoya dîlanê bicih bihêlî, bo vê ku jiyan te bicih nehêl e. Seko peyveke mecazî ye, her cihek û her demek ku tenê dilê te bixwaze laşê xwe bivilvilînî, muzîk berdewamiyê dide bi zindîbûna laş û ruhê me, ruh û hizrkirina me nû dike..

Jiyana li ser vê axê bêyî muzîk li cîhanê dê çiqas bêzar bidûya. Dengê pevhevketina pelan, bayê ku pelan dihejîne, çîçika çivîkan û qebe qeba kewan, herikîna çeman, heta hareya otomibîlan ku wirda derbas dibin û lingên peyayan hemû muzîk in. Eger ev deng nebûyana jiyan dê çi dojehek bibûya.
Celaleddîn Rumî di axaftineke xwe de evîn, dîlankirin û muzîkê bi awayeke xweş bi hev re girê dide: “Bê evîn hemû muzîk tenê qîrîn e, her dîlankirinek jî dînîtiye û hemû xwedaperest jî koletî ye.

Axir, ger ne evîna Xwedê be, çi tiştek wisa li van derwêşan dike ku bi vî awayî dîlan dikin û hemû laşê van li cihekê û canê van li cihek din û duayan dikin? Rumî ku ji muzîk, helbest û dîlanê re bawerî hebû ku xwe bigihîne Xwedê got: “Yê ku kêfa vê ji dîlanê re tê namire.” Ew jî dibêje: Guh bide bilûrê çîroka xwe behs bike û gazinan ji derdê veqetînê bike.

Lê, eger em tenê ji bo xwe nimêjan bikin û dîlan bikin, yan jî nimêj û dîlan li cihê kêrhatî yên xwe de bên kirin, wê demê nimêja te ne ji bo acizkirina min be, ne jî dîlana min ji bo acizkirina te dibe.

# Koça dawî ya Beytocan û kurtasiyek ji jiyana wî

Hunermendê navdar ê Kurd Beytocan, roja 12ê Îlonê li welatê Swêdê bi sedema nesaxiya şêrpenceyê koça dawiyê kir.

Baytullah Guner naskirî bi Baytocan, di sala 1955an de li navçeya Ferqînê ya Amedê ji dayîk bibû. Baytocan piştî kodeteya leşkerî ya 12ê Îlona 1980ê ji aliyê hikûmeta Tirkiyê ve hatibû girtin û 15 sal cezayê girtîgehê li dijî wî hatibû sepandin, lê piştî şeş sal û nîv meh girtîgeh hate berdan. Piştî ku ji girtîgehê derket, ji Amedê ber bi Stenbolê ve çû.

Baytocan di sala 1990ê de yekemîn albûma xwe ya bi navê “Yan Mirin an Diyarbekir” derxist û piştî salekê ji derketina albûmê, ber bi Ewropayê ve çû û li Swêdê nîştecih bû.


Baytocan piştî çar salan lihemberderkevtin li dijî nexweşiya şêrpenceyê, li Stokholma Swêdê û dûr ji welatê xwe koça dawî kir.



# Çend wêneyek ji dema biaxspartina hunermendê Kurd Beytocan li Stockholmê







# Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

**Hêzên rejîma Îranê 9 welatiyên xelkê bajarê Qurwê ji destpêka vê heftiyê ve binçav kirine**

Ji destpêka vê heftiyê ve, hevdem digel salvegera şoreşa "Jîna"yê, 8 welatiyên Kurd û welatiyekî Tirk ên xelkê bajarê Qurwe yê ser bi parêzgeha Sinê, ji aliyê rejîma Îranê ve hatine binçavkirin.
Pêka rapora Rêkxirawa Mafê Mirovî ya "Hengaw"ê, ji destpêka vê heftiyê ve 8 welatiyên Kurd ên bi navên "Resûl Sultaniyan, Arman Sultaniyan, Ebdulla Ebdulmelikî, Mehdî Feyzî, Arman Kûhî, Umîd Xusrewî û herwisa 2 nûciwan din ên bi navên "Teha Wermeqanî û Metîn Qenberî" ên temen 15 salî û herwisa welatiyekî Tirk ê bi navê "Mihemed Şêxceiferî", hevdem digel yekemîn salvegera şehîdbûna "Jîna"yê û destpêkirina tevgera "Jin Jiyan Azadî"yê hatine binçavkirin.
Di vê derheqê de roja Sêşemî 28ê Xermananê, "Arman û Resûl Sultaniyan" ji aliyê hêzên Îtilaata Spaha Pasdaran a terorîst ve, li bajarê Qurwê hatine binçavkirin; Arman kasibkarekî bajarê Qurwê ye û sala derbasbûyî jî carekê li meşa şoreşa "Jîna"yê bo heyamekê, hatibû binçavkirin.
Herwisa roja Şemî 25ê Xermananê, 2 nûciwanên xelkê bajarê Qurwê yên bi navên "Metîn Qenberî û Teha Wermeqanî" yên temen 15 salî, ji aliyê Îtilaata Spaha Pasdaran a terorîst ve li vî bajarî hatine binçavkirin.
Ji aliyê din ve, di hemen rojê de û hevdem digel destpêka şoreşa "Jîna"yê, mamosteyî malnişînkirî yê bi navê "Ebdulah Ebdulmalikî" û "Mehdî Feyzî" ji aliyê girûpek ji hêzên Spaha Pasdaran ve hatine binçavkirin.
Di berdewamiya menca binçavkirinan de li sibêdeha roja Sêşemiya vê heftiyê, xwendekarê qonaxa karnasiya endazyarî ya nermeamêrên Kampiyûterê li zanîngeha Kurdistan a bajarê Sinê "Mêhran Kûhî û Umîd Xusrewî" bi bê belgeyên dadgehê, di mala xwe de li bajarê Qurwê hatine binçavkirin.
Heta belavbûna vê nûçeyê, ti zanyariyeke serast û hûr li derheq rewş, cihê ragirtin û tohmetên sepandî bi ser wan welatiyan de, li ber dest nîne.

**Encumena Kesk a Çiyaya Merîwanê li derheq binçavkirina çendîn kes ji endamên vê encumenê daxuyaniyek belav kir**

Encumnena Kesk a Çiyaya Merîwanê li derheq êrîşkirina hêzên ewlehî û leşkerî li ser rêûresma vebîranîna salvegera şehîdbûna 3 şehîdên jîngehê ku di 19ê Xermananê de li baxçeyê yek ji endamên vê encumenê de bi rê ve çûbû daxuyaniyek belav kir.
Di beşeke vê daxuyaniyê de hatiye ku hêzên ewlehî û leşkerî bi hêzeke zêde û bi awayekî berfireh û bi hov ve, êrîş kirine ser beşdarên vê rêûresmê ku çendîn jin û zarok jî beşdar bibûn û 28 kes ji kesên beşdar di vê rêûresmê de binçav kirin û dest bi ser mobaylên endaman û 36 pilakên maşînên kesên han de girtin.

Encumena Kesk a Çiyaya Merîwanê di vê daxuyaniyê de diyarî kiriye ku wan hêzan bi bê belgeyên yasayî û dûr ji hemû pirensîpên exlaqî û yasayî û parastina kerameta mirovî êrîş kirine ser wan û piştî 5 demjimêr lêpirsînê li demjimêr 2ê sibêdehê 25 kes ji wan azad kirin û mobayl û pilakên maşînên wan nedan".

Pêka vê daxuyaniyê, 3 kes ji endamên vê encumenê yên bi navên "Kawe Kerîmiyan, Madih Xweşnewaz û Kawe Destan" di girtigehê de ragirtin û piştî derbasbûna 7 rojan tenê "Kawe Destan" azad kirin û tevî hemû lipeykevtinên vê encumenê li derheq cihê ragirtina wan 2 endamên encumenê ti zanyariyek li ber dest nîne.

Herwisa vê encumenê tevî şermezarkirina tund a vê kiryara rejîmê, daxwaz kiriye ku bi zûtirîn dem û bi bê mercan endamên girtî yên vê encumenê bêne berdan, mobayl û pilakên maşînên beşdarbûyên rêûresmê bêne dan û dezgehên ewlehî û leşkerî yên rejîmê divê ji Encumena Kesk a Çiyaya Merîwanê daxwaza lêborînê bikin ku bi awayekî neyasayî êrîşî kombûna vê encumenê kiribûn û bûne sedema tirs û bêrêziyê.

**Welatiyekî Kurd ê xelkê bajarê Urmiyê ji aliyê hêzên rejîmê ve hate girtin**

Welatiyekî Kurd yê bi navê Ebas Mûsewî Qasimlo yê xelkê devera Mirgewer a ser bi bajarê Urmiyê ji aliyê hêzên rejîmê ve hatiye girtin û bo cihekî nexuya hatiye veguhastin.

Li gorî raporta Kurdpayê, roja Sêşemî 28ê Xermananê welatiyekî Kurd yê bi nave Ebas Mûsewî Qasimlo yê temen 34 salî û xelkê gundê Girdiwan yê ser bi devera Mirgewera Urmiyê ji aliyê hêzên rejîmê ve hatiye girtin û bo cihekî nexuya hatiye veguhastin. Ebas Mûsewî hostayê karê armatorbendiyê ye û hêzên rejîmê bi bê hebûna ti belgeyek yasayî rijiyane ser cihê karê navbirî û girtine. Heya dema belavbûna vê nûçeyê, sedema girtin û tohmetên ku bi ser Ebas Mûsewî Qasimlo de hatinî sepandin ti zaniyariyek ber dest nîne.
Her di vê derheqê de li gorî Ajansa Nûçegihaniya Mafê Mirovî ya Hengawê, di navbera 20 rojên borî de aliyê kêm 150 welatiyên Kurd ji aliyê hêzên rejîmê ve hatine girtin ku nasnameya wan hatiye piştrastkirin, wate di her du rojan de bi giştî 15 welatiyên Kurd hatine girtin.

# Agirî


◆ Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE   E - Mail: Agiri2003@gmail.com   Hejmar (454)